# DEMA DÊBAVÎTIYÊ, ANGO SERDAN

Pêvajoya qanûnî ya serdanê li Dakotaya Bakur wekî Berpirsyariya Welayetê tê binavkirin. Armanca dema dêbavîtiyê ew e ku têkiliyeke dêbav-zarokî ya di berjewendiya zarokî de bê teşwîqkirin, heke ev dema dêbavîtiyê zarokî nexe nav xetereyê.

*Planên Dêbavîtiyê*

Planeke dêbavîtiyê bernameyeke berfireh e ku ji aliyê dayik û bavan ve tê çêkirin, lê heke dayik û bav nikarin li hev bikin, ji aliyê dadgehê ve tê çêkirin û fermankirin.

Qanûnên Dakotaya Bakur li dayik û bavan ferz dike ku ji bo diyarkirina welayet û demên serdanê planeke dêbavîtiyê hebin. Ev plana dêbavîtiyê ji bo berjewendiyên herî bilind yên zarokî tê çêkirin û divê bi qasî pêkan e berfireh be. Plana dêbavîtiyê ji bo hindê tê çêkirin ku alîkariya diyarkirina rolên dêbavîtiyê û demên welayetê bike û pevçûnan kêm bike da ku dayik û bav siberojê neyên ber dadgehê.

Mînakeke planeke dêbavîtiyê li [virê]() li bin Paragrafên 4 û 18 heye.

*Maweya Dêbavîtiyê ya Çavdêrîkirî*

Di hin rewşan de dadgeh dikare biryara maweya dêbavîtiya çavdêrîkirî bixwaze. Dema dêbavîtiya çavdêrîkirî bi piranî ew dem e ku maweya dêbavîtiyê ji hêla aliyekî sêyemîn ve tê çavdêrîkirin. Li Dakotaya Bakur navendên dêbavîtiyê hene û divê gava pêkan be bên bikaranîn.

Maweya dêbavîtiya çavdêrîkirî tenê di mercên ku tenduristî û ewlekariya zarokî di xetereyê de be tê bikaranîn.  Dadgeh bi gelemperî sînoran datîne dirêjahiya maweya dêbavîtiya çavdêrîkirî û/yan jî derfetê dide aliyê din ku derbasî maweya dêbavîtiyê ya neçavdêrîkirî bibe.

*Redkirina Maweya Dêbavîtiyê*

Heke tu ji maweya dêbavîtiyê hatibî redkirin, demên hatî redkirin bişopîne û ji aliyê din ango dayik yan bav bixwaze ku demên te zarok nedîtî qerebû bike. Heke aliyê din dema te ya birêkûpêk ya bi zarokî re red bike, dibe ku pêdiviya te bi gazîkirina parêzerekî hebe da ku ji bo şopandina maweya dêbavîtiyê alîkariya te bike. Heta ku dayik yan bav fêm neke ku ev mawe dê zarokî bixe nav xetereyê, divê maweya dêbavîtiya hev red nekin.

Heke aliyek ji dayik yan bavî li gorî fermanên dadgehê tev negere, divê aliyê din dawî li piştgiriya zarokî neyne yan jî destûrê nede maweya dêbavîtiya aliyê din.  Dadgeh dikare dayik yan bavê li gorî plana dêbavîtiyê tevnegerin ceza bike.



North Dakota Domestic & Sexual Violence Coalition
Projeyeke ji aliyê NDDSVC ve ji bo we hatiye pêşkêşkirin - Gulan 2020